# Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1207 | 25-Îlon-2024 | www.ronahi.net/ku/



**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218


# Di nav çanda kurdî de 'Payîzxêr'



**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Payîz saldemeke û yek ji çar werzên salê ye, ev werz xwedî taybetmendiyên cuda ne. Payîzxêr jî diyardeyeke navlêkirina wê ji çand û baweriya gelê kurd a di derbarê werzê payîzî hatiye der ango tê wateya barîna baranê berî dema xwe.**

Kengî demsala payîzê ya sala 2024'an dest pê dike? dibe ku ev pirseke mezin be û di hişê gelek kesên ku xwe amade dikin demsala payîz û zivistanê, de hebe. Bi taybet piştî germahiya havîn a ku şahidê zêdebûna germahiyê bû, tê xuyakirin jî ku welatî bendewarên hênikbûna atmosfera gerdûnê ne. Di van rojên em tê de ne, dem ber bi payîzê ve diçe, li gorî guhertina avhewayî ya cîhan, Rojhilata Navîn û Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê re derbas dibe, em dikevin werzê payîzî. Eger di milê şînahî, dar û xwezayê de, dê li ser taybetmendiya payîzê rawestin. Di payîzê de rengê piraniya daran tê guhertin, pelên wan zer dibin û hildiweşin. Hin darên din jî bi berhem didin. Di heman demê de gelek cureyên giyayên ku mirov wan dixwe, di werzê payîzê de tên çanidin û ev giya xwedî sûdmendiyeke mezin in.

**Kengî demsala payizê ya 2024'an dest pê dike?**

Li gorî hesabên astronomîkî, nîvsala havînê di 21'ê îlonê de diqede û nîvsala payizê ya 2024'an dest pê dike û wê sê mehan berdewam bike. Roj êdî ber bi başûr ve diçe, ji ber vê yekê meyla tîrêjên wê kêm dibe û saetên roj û şevê di wê demê de dibin yek. Ev hemû nîşaneyên hatina payîzê ye. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî di roja pênşema bûrî de, baran li gelek deveran bariya û pê re jî rewşên birûsk û tavan çêbûn. Lê di roja yekşemê de li gelek bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê baraneke gur bariya û rêjeya germahiyê bi jêr ve çû.

**Baran dê zû bibare?**

Bi destpêka demsala payîzê ya 2024'an re, pir kes li bendê ne ku ew ê bibe fersendek ji bo barîna baranên giran û herkîna lehiyan û hin kesên din wê bibêjin ku hîna germahiya havînî didome. Li gorî Navendên Cîhanî ji bo Hilberîna Pêşbîniyan a Rêxistina WMO'yê, ji ber wê rêjeya barîna baranê di demsala payîzî de, wê bilind bibe. Bi taybet depresyona demsalî ya Sûdanê ku bi depresyonên heyî yên asîmanî yên derdorê re, demsala payîzê dê bibe şahidê zêdebûna baran û dibe ku rewşa lehiyê çêbibe li gelek deveran. Lê li gorî WMO'yê, nîvê pêşîn ê payîzê, ku mehek û nîv e, dê germahiyek bilind hebe, ji ber ku taybetmendiyên havînê digire nav xwe, nîvê din jî bi diyardeyên xwe yên cuda yên hewayê pir nêzî hewaya sar a zivistanê be.

**Di nav çanda kurdî de 'Payîzxêr'**

Di nav gelê kurd de bi taybet civaka gundîtiyê têgeha Payîzxêr tê bikaranîn. Ev peyv helbet ne hema ji xwe ber tê gotin, lê belê hin di encama hin sedem û demeke diyar de tê gotin. Dema ku baran bi rengekî geş di destpêka saldema payîzê de dibare, payîzxêr jê re tê gotin. Ango barana bi xêr û bêr di zûtirîn dem de hat barîn. Li ser hizra ku êdî wê zivistan bi xêr û bêr be, demsala buharê bi kulîlk û giya be herwiha havîn ku were jî bi berhem be, xweşpêşbînî ji aliyê civaka kurd ve tên kirin. Lê eger Xwedê hez ke û ti bobelatên cuda çênebin pêşbîniyên kesên bi vî rengî dihizirin, heta radeyekê bi cih tên. Li aliyê din piştî ku payîzxêr dikeve, giya li deşt, erdên çandinî û çemên miçiqî zîl dide. Ev giyayê ku di saldema payîzê de şîn tên giyayê herî xweş li ber dilê lawirên giyaxur e. Lewma jî em dibînin ku çiqasî gelê kurd çiqasî bi xwezaya xwe ve girêdayî ne û navlêkirina payîzxêrê diyardeyeke xwezayî û ji çanda civaka gundan e. Li aliyekî din jî, kurdan di rabirdûyê de hin pend û gotinên pêşiyan ji bo payîzê bi kar anîne. Nimûne; Payîz e mij û dûman e berx ketiye sifra guran. Payîz e, ev dem çû, ber zivistan derd giran bû. Şîrê payîzan bidin ezîzan.

**Bandora payîzî li ser derûnî û laşê mirovan**

Payîz encama werzê havînî yê germ û zuha tê der, lewma jî atmosfer û bayê wê zuha be. Ji ber vê jî bandoreke mezin a payîzê li ser mirov heye. Di despêkê de li ser şermê mirov, laşê mirov rastî zuhayî û nexweşiyan tê gelek pirzik û girêkên biçûk li ser rû û laş derdikevin.. Herwiha pora mirov, bi taybet a jinan diweşe. Li aliyê din jî rewşa payîzê bandorê li derûniya mirov dike, mirov bargiran û dilxemgîn dibe. Şev bi ewrên giran û tarîbûna xwe, sibeh bi bêdengî û bahoz û toza xwe derûniya mirov ji xweşiyê dûr dixe. Lewma dema ku ji mirovekî re tê gotin ew dilpayîzî ye, tê wateya ku ew gelekî xemgîn e.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ba di ber re naçe:**
- Saxlem e; têkûz e; birêkûpêk e; biserûber e.

**Biserûber kir:**
- Rast kir; bi rêkûpêk kir; xemiland; bi ser hev de da; kêmayiyên wê rast kirin.

**Destê xwe xistiye bin serê xwe:**
- Karê wî têkûz e; dilê wî rihet e.

**Girêka li pişt girêkê ye:**
- Karê wî têkûz e, pêwîstiya wî bi ti kesî nîne, dilê wî rihet e.

Kê genim çandiye û garis rakiriye?
- Kesê karê xwe têkûz bike wê encameke baş jê bigire.

**Li hev nêrûmê kirin:**
- Li hev siwar kirin; bi hev ve asê kirin; derbasî hev kirin; niçlika yekê derbasî qula ya din kir.

**Lingê wî cih girt:**
- Karê xwe saxlem kir; karê xwe serrast kir.

**Lingê wî erd girt:**
- Bi heman wateyê.

**Lingê wî sefik girt:**
- Bi heman wateyê.

**Piştrast bû:**
- Bawer kir ku êdî xeter nemaye.

**Pişta wî li tehtê ye; pişta xwe daye tehtê:**
- Karê xwe têkûz kiriye; pişta xwe daye cihekî saxlem; alîkariyê ji kesên saxlem digire; yên piştgiriyê didinê xiyanetê lê nakin.

**Pişta wî xurt e:**
- Bêpakî ye; hêzê ji cihekî xurt digire; cihê pişta xwe dayiyê qayîm e

**Pişta wî saxlem e:**
- Bi heman wateyê.

**Pişta xwe rast kir:**
- Bawer kir ku êdî xeter nemaye.

**Pişta xwe kutaye çiyayê bilind:**
- Bêpakî ye; hêzê ji cihekî xurt digire; cihê pişta xwe dayiyê qayîm e.

**Sibê lê nake êvar:**
- Wê di cih de bike; dereng nahêle; nahêle dem di ser re derbas bibe.


**Weke korê kêç bikeve destê:**
- Pir baş zetim kiriye; êdî ti kes nikare ji destî wî derîne.

**Weke mêşa bikeve nava lepê koran:**
- Bi heman wateyê.

**Ba jê baran jê:**
- Bixwe dike bixwe dev jê berdide; dibêje lêbelê lê xwedî dernakeve; dibêje lê nake; di nava nakokiyan de ye; hem bixwe kiriye, hem xwe neqayîl dike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Nalên avêtî gencîneya Thamas in



Peykersazê bi navê Jamie Thomas ji bo tiştên avêtî pênaseyeke wiha dike; "Çop û gemara mirovekî gencîneya mirovekî din e." Ew peykersazekî ji Zelendaya Nû ye û bêhtir ji tiştên avêtî peykerên xwe çêdike. Nexasim jî nalên avêtî yên hespan pir bala wî dikşînin û ji van nalan peykerên heywanan çêdike.

Jamie Thomas nalên hespan ji du kesan kirriye. Ev du kes jî ev 20 sal in ku nalên haspan kom dikin. Jamie Thomas pêvajoya çêkirina peykerên xwe digire vîdeoyan û van vîdeoyên xwe li ser hesabên xwe yên medyaya civakî parve dike. Her wiha ew dixwaze bi rêya van vîdeoyan perwerdeya peykeran jî bide xelkê. Jamie Thomas dide zanîn ku karê wî gelek zehmet e lê ji zehmetiya karê xwe hez dike û dibêje; "Gava insan halê dawî yê peykerên min dibînin pir kêfxweş dibim û xwe baş hîs dikim."

## bi kamîreya ronahî



Bendava Firat Tebqayê

## 'Serdan û xebatên insiyatîfê pîroz in'



Welatparêzê ku insiyatîfê serdana wî kiribû, Şêro Şero da zanîn ku xebata Insiyatîfa Sûrî ya ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan xebateke pîroz e. Herwiha Şero diyar kir ku bi saya insiyatîfê û gelên azadîxwaz îro mijara azadiya Rêber Apo li ser asta cîhanê tê nîqaşkirin.**R-5**

## Malbatên Şehîdan: Malbata Barzanî asta xiyanetê derbas kiriye



Endamên Meclisa Malbatên Şehîdan diyar kirin ku êrişên li ser Herêmê Parastina Medya tên meşandin, kiryarên dagirkirina xaka Başûrê Kurdistanê ye. Herwiha bîbirxistin ku pêwîste pêşmergeyên welatparêz nebin amûra şerê dagirkeriyê.**R-3**


# Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1207 | 25-Îlon-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S




## Dildarê pênûs û helbestê Ebdulrehman Mihemed

Helbestvanê kurd Ebdulrehman Mihemed, wekî gelek helbestvan û nivîskarên kurd yên navdar, di jiyana xwe de gelek êş û azar dîtiye, lê bi dildariya helbest û pênûsa xwe tevahiya zehmetî derbas kirin û berhemên giranbuha pêşkêş kirin.**R-7**



## 'Ji bo avakirina xwendekarên aktîv û xwedî zanist gavên mezin tên avêtin'

Hevseroka Desteya Perwerdê û Hindekariyê li Kantona Efrîn û Şehbayê Heniya Kalo diyar kir ku li kantona Efrîn û Şehbayê Desteya Perwerdeyê sala xwendinê ya nû bi hêz û vîneke mezin xwendekarên xwe pêşwazî dike.**R-6**

# HÊRS Û KÎNA DILÊN XWE KIRIN ÇEKA TOLHILDANÊ

Di 26'ê Îlona 2022`an de, du Gerîlayên fedayî Sara Goyî û Rûken Zelal, li hemberî navenda polîsan a li navçeya Mezîtlî ya Mêrsînê ya li Tirkiyê çalakiyeke fedayî kirin, ev çalakî bersiva zextên ku li zindanan têne meşandin, komkujî û êrişên bi çekên kîmyewî yên li dijî Gerîlayan bû. Îro jî li ser şopa canfedayên azadiyê, Gerîlayên Apoyî li Qadên Berxwedanê derbeyên giran li dagirkeran dixin û rêya pîroz dewam dikin.**R-2**







## Saziya Sîxurtiyê; PARASTIN

Parastin dezgeha îstixbarata girêdayî PDK'ê ya Başûrê Kurdistanê ye. Ev sazî di destpêkê de ji bo armancên cuda hat damizerandin. Lê her ku çû ew bû amûra sîxurtiya dagirkeriyê û têkbirina têkoşîna gelê kurd.**R-4**


Her tim jinê tewambar dikin — Nehîr pale R-2
3 şehadetên çapemeniya azad — Farûk Sakik R-5
Rewşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê — Zekî Bedran R-5
Nifşên wêjeyî.. nakokî lê rêzgirtin.? — Kemal Necim R-7

# Sara û Rûken; Erşê dijmin hejandin

Di 26'ê Îlona 2022`an de, du Gerîlayên fedaî Sara Goyî û Rûken Zelal, li hemberî navenda polîsan a li navçeya Mezîtlî ya Mersînê ya li Tirkiyê çalakiyeke fedaî kirin, ev çalakî bersiva li zextên li zindanan, komkujî û êrîşên bi çekên kîmyewî yên li dijî Gerîlayan bû.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Dijminê kujer bênavber xwînê dirjîne. Faşîzm mirinê tîne û dixwaze her tiştî tine bike û bi êrîşa li dijî nirxên ku li Kurdistanê ji nû ve hatine avakirin, êrîşî jiyana azad dike, mirovahî, çand, ziman, reng û olan dike hedef. Lewra du jinên bedew û leheng, careke din ji bo tola hevalên xwe yên ku ji bo azadî û parastina Kurdistanê şer dikin û li dijî wan bombe û çekên kîmyawî tên bikar anîn hilînin, ya herî girîng jî, ji bo dawî li zilm, dîlgirtin û işkenceyên giran ên li zindanan bînin, bi taktîk û teknîkekî jêhatî di cihek ku dijmin qet çaverê nedikir çalakiya fedaî pêk anîn.




**Rûken û Sara bûne canfidayê gelê xwe**

Di şeva 26'ê Îlona 2022'an de, li ser navenda polîsan a li Mezîtlî ya Mersînê Şehîd Sara û Rûken bi wêrekiyeke mezin, bi xwe bawer, bi xwînsarî û bi biryardariyeke mezin bi ser dijmin de çûn û ruhê fedaîtiyê nîşan dan û dewleta mêtinger şoq kirin. Ev çalakî bi rê û rêbazeke ku hikûmeta AKP-MHP'ê ya faşîst bi ti awayî pê nehesiya û jê fêhm nekir. Berxwedêrên bê hempa Sara û Rûken bi tivingê karîbûn bikevin bin pozê dijmin. Beriya ku tiştekî bikin, yekser gule li polîsên li koşka Nizamiye reşandin û piştre bi çekên lûle dirêj bi hêzên dijmin re ketin pevçûnê û bi awayekî serkeftî gihiştin armanca xwe. Herwiha di plansaziya wan de çalakiya teqemeniyê gava herî tûj bû. Nasnameya armancê bi baldarî û bi zanebûn hate çêkirin. Ew polîsên ku peywirên taybet ên wekî dabînkirina ewlehiya burokrasiya dewletê pêk tînin kirin hedef. Hedef ne hêzên pêşî yên dijmin ên ku bi awayekî rasthatinî li pêşiya wan derketine, lê komên ku ji bacên gel sûd werdigirin bûn. Serbazên têkoşer ji serî heta dawiyê, tam li gorî plansaziyê, weke tîmeke gerîlayên xweser bi planên xwe re dilsoz man.

**Bi hêz û vîna xwe djimin tar û mar kirin**

Şehîd Sara û Rûken perspektîfa tîma gerîla ya fedaî ya profesyonel ji xwe re esas girtin, xwe ji çiyê berdan, tora îstîxbaratê ya dijmin têk birin û bi rengekî serkeftî gihîştin armanca xwe. Gerîlayên ku ji bo pêşî li qirkirina gelê Kurd bigrin xwe feda dikin û nirxên herî pîroz in. Ev çalakî di asta herî bilind a profesyoneliyê de bi hostatî hate plankirin ku bi ti awayî zerar negihêje sivîlan. Lehengên berxwedêr ev plana xwe bi rengekî serkeftî bi cih anîn, piştî ku bi dijmin re şer kirin, dijmin bi ser xwe ve kişandin û teqemeniyên amade kiribûn teqandin. Bi vî rengî çalakiya xwe pêk anîn û şehîd bûn. Hikumeta AKP-MHP'ê bi zanebûn dixwestin nîşan bidin ku şehîd Sara û Rûken ji Rojava hatine û çalakî kirine, lê nikarîn vê yekê tesbît bikin, ji ber Şehîd Sara û Rûken tu têkiliya xwe bi rêxistinên li Rojava re nîn bûn. Di heman demê de, wezîrê karên tawanan ê hukûmeta şerê taybet, wekî her carê bi lez û bez çû cihê çalakiyê û hewl da encamên çalakiya fedaî veşêre, lê hate naskirin ku windahiyên dijmin gelekî zêde ne û encamên çalakiyê aliyên bîrdozî, leşkerî û siyasî hejandiye.

**Kurtejiyana Şehîd Sara Tolhildan**

Şehîd Sara li navçeya Qilebanê ya Şirnexê, li nava malbateke ji eşîra Goyî ya welatparêz ji dayik bû. Li xaka Botanê ya pîroz bi hişmendî û çanda Kurdîtiyê mezin bû, lê neçar ma ku di zarokatiyê de koçî metropolên Tirkiyeyê bike, li wir xebitî. Di temenê xwe yê ciwantiyê de ked nas kir, kedkarî û xebatkarî taybetmendiyên herî eşkere yê karaktera wê bûn. Tevî ku çûbû metropolan jî aqlê wê timî li welêt, çiyê û hevalên li çiyê bû û hîn di zarokatiyê de dixwest bibe gerîla. Tevî ku timî jê re dihate gotin tu biçûke nabe û tevlîbûna wê dihate astengkirin, lê gava ku dema wê hat bi însiyatîfa xwe berê xwe da çiyê û bû gerîla.

**Sara rastiya jina azad kir rêgeha meşa azadiyê**

Sara di sala 2009'an gava destpêkê bêhesab avêt, lê bifikir, eşq, çoş, kêfxweşî, kelecan û ji dil tevlî nava jiyana gerîla ya pîroz bû. Herwiha di sala 2010'an de cihê xwe di nava Hêzên Taybet de digirt. Di pêvajoya perwerdeya Hêzên Taybet de, ji pêşeng û damezrînerên PKK` şehîd Sara (Sakîne Cansiz) hînê çand û rêbaza jiyana PKK'ê bû, di heman demê de coş û rastiya jina azad a di kesayetiya Sakîne Cansiz de ji xwe re kir rêgeha meşa şoreşgerî. Sara piştî ku şehîd Jinda Ozgur (Nûrcan Ekîncî) nas kir ku sala 2017'an dema Fermandara YJA Starê ya Eyaleta Garzanê bû şehîd ket, her timî bi heyranî da ser şopa wê.

**Tovên jiyana azad çandin û di dilê xwe de kom kirin**

Piştî Sara dewreya xwe ya bingehîn, perwerdeya xwe ya branşê bi daxwaz, cidiyet û hesasiyeteke mezin bi cih anî û bi ser xist. Yekser diyar kir ku ew amade ye çalakiya fedaî bike û pêşniyar kir, lê belê rêxistinê pêşniyara wê zû dît, lewra ji bo wezîfeyên cuda hate erkdarkirin, ev wezîfe jî ji bo xwe amadekirina ji bona çalakiya fedaî weke gavên destpêkê nirxand û heta ku armanca xwe pêk bîne, bi rengê herî çalak û baş tevlî her wezîfeyê bû. Di dawiyê de serlêdana wê ya ji bo tevlîbûna Tabûra Nemiran hate qebûlkirin û tevlî perwerdeya tabûrê bû. Li hemberî rastiya xwe, li hemberî taybetmendî û aliyên dijmin ê mêtinger ê li ser kesayetiya xwe kete nava têkoşîneke mezin. Sara di nava vê civakê de li derveyî sîstemê civakeke nû nas kir, tovên jiyana azad çandin û di dilê xwe de kom kirin. Hîn bi kûrahî bi heqîqeta Rêbertî daket. Dilsoziya wê ya bi rizgarî û azadiyê zêde bû, hêrsa li dijî dijmin mezin bû. Ziman û axaftinên Sara mîna Zîlan (Zeynep Kinaci) bû ku şopdara heqîqetê bû.

Kurtejiyana Rûken Zelal

Şehîd Rûken li Rojavayê Kurdistanê ji dayik bû, li Qamişlo mezin bû. Bi şoreşa Azadiyê ya li Rojava, bala xwe çû ser gerîla. Bi rengekî çalak tevlî têkoşîna şoreşa li Rojava bû, lê hîn jî bala wê li jiyana azad a li çiya bû. Zanîbû ku gefa herî mezin a li dijî hebûna Kurdan, dewleta Tirk a mêtinger û qirker e û ji bo li dijî dewleta Tirk a faşîst li Bakurê Kurdistanê şer bike, di sala 2014'an de berê xwe da çiyayên azad. Heman piştî perwerdeya şervanên nû, li ser bingeha pêşniyara tevlîbûna li nava Hêzên Taybet dest bi perwerdeya dewreya bingehîn kir. Ji bo tevlîbûna li nava Hêzên Taybet wiha digot: "Ez dikarim bêjim ku min xwe di nav Hêzên Taybet de nas kir. Lêgerîna min a pêşniyara çalakiya fedayî bi çalakiyên Heval Doga û Heval Zinar destpê kir. Ji ber her du heval min di jiyanê de jî nas dikir. Me bi Heval Doga re heman perwerde dît û bi heval Zinar re jî li heman navendê man. Sekin û tevlîbûna van hevalan bandoreke mezin li min kir."

**Bi pêşengtiya şehîdên qehreman, destan têne nivîsandin**

Şehîd Rûken di hemû dewreyên perwerdeyê de, bi ser ket û tiştên hîn dibû hînî hevalên xwe dikir. Herwiha li gelek qadên cuda yên têkoşînê kar kir. Her wezîfeya ku pê erkdar dibû, ji bo xwe weke şens dît û timî dixwest çalakiya fedaî bike. Pêvajoya Siyanê ji bo Rûken demeke diyarker bû. Piştî Siyanê careke din û gelekî zêde israr kir û bi biryar pêşniyar kir ku çalakiya fedaî bike. Têkoşer Rûken bi vê gotinê pêşniyara ji bo çalakiya fedaî kir: "Her roj di pêşengtiya şehîdên qehreman de, destan tên nivîsandin. Dewletên ku ji xwe re dibêjin em endamên NATO'yê ne, îro li beramberî rêbazên me yên nû û ruhê fedaî, ketine nava pêxîrtengiyeke pir mezin. Ji ber vê ye ku bi sedan caran gazên jehrî bi kar tîne, serî li her cûre rê û rêbazên bê exlaq dide. Wexta mirov li kûraniya vê rastiya şer binêre, wê mirov bibîne ku dewleta Tirk a dagirker, çiqas ji hêz ketiye. Lê ya girîng ew e ku mirov van rastiyan baş bibîne û li hemberî vê, sekna pêwîst raber bike.

**Sara û Rûken li dora heman armancê li hev civiyan**

Sara û Rûken hemû zanîn û ezmûna xwe bi hev re parve dikirin. Rûken temenê wê li gorî Sara biçûk bû. Ew wekî mamosteya xwe li Sara dinêrî û Sara bi rastî, bi coş û kelecan hewl dida ku Rûken pêşde bibe, ew lênêrîna wê dike û timî mijûl hev dibûn. Sara, Rûken di şert û mercên herî giran de, berê xwe didin armancên xwe yên serkeftinê. Di van rêyên zehmet de dikevin, radibin, hêrs dibin, dikenin, diwestin, kêfxweş dibin, her tiştek di nava hev de dijîn. Bi hev re dinyaya xwe ya wateyan dihûnin û kûr dikin, ew her roj tiştekî kifş dikin, her roj ew ji bo fêrbûna tiştekî nû hewl didin û her roj ew dest bi ramanekê dikin. Ew fêrî zimanê çiyayan dibin. Ew têdigihin ku xweza, çiya, dayik e. Ew dest pê dikin ku xwe di zikê Dayikê de, ango di xwezayê de bibînin. Her çiqas nas dikin, ewqas peywendiyek giyanî bi wan re çêdibe. Ev herdû qehremanên fedekar ku qet bi hev re nemabûn, hev nas nedikirin, li dora heman armancê û sonda tolhildanê li hev civiyan.

**Ji Pênûsa Jin**

**Her tim jinê tewambar dikin**

Nehîr Pale

Sîstema baviksalarî zîhniyeteke gelekî gemar û kirêt di mejiyê mirovan de daye çandin. Di encama zayendperestiyê de gelek pirsgirêkên civakî yên giran derdikevin holê. Jin di hemû rewşan de tê sûcdar kirin. Mînak sîstem dema ku mêr işkence dike, mêr jî qehra xwe di serê jinê ve derdixe. Wê jin jî di vê rewşê de ji ber zagonên ku civakê ji bo wê diyar kirine, her tiştî tehemul bike. Ev yek mirin bi xwe ye.
Dayîkek rojane ji aliyê hevjînê xwe ve tê işkence kirin, hevjînê wê kuran dixwaze. Ew mêr ne tenê tûndiyê li hevjîna xwe dike li herdû keçên xwe jî dike. Tenê du keçên wî hene û hevjîna wî nema dikare zarokan bîne. Sedema ku dayîk nema dikare zarokan bîne mêr bi xwe ye, lê ya tê ceza kirin jin e. Gelo pirsgirêka vê malbatê wê bi tûndiyê çareser bibe?
Ew malbat ji bajarê Meyadîn ê Dêra Zorê ye, mêr ji aliyê rejîma Sûrî ve tê girtin û dema Hikûmeta Şamê bajarê wan bombebaran dike, kurê wî yê bi tenê tê kuştin. Di girtîgehê de wî gelekî giran işkence dikin û wî tînin rewşa ji mêrtiyê bixînin. Piştî ku mêr ji girtîgehê tê berdan êdî pirsgirêkên wan ên malbatî zêde dibin. Mêr şûna ku hesab ji dewletê bixwaze hevjîn û keçên xwe işkence dike. Hevjîn û keçên wî gihîştine rewşa ku intîharê ji xwe re çareserî dibînin. Eger dewletê işkence li mêr kiriye çi sûcê hevjîn û keçên wî ye?
Her wiha di destpêka şoreşê de hikûmeta Şamê dema ku Meyadîn bombebaran dike kurekî wan ê 6 salî tê kuştin. Dîsa dayîk tê sûcdar kirin û dibêjin kurê xwe neparastiye. Pirsgirêkên vê malbatê bi vî rêbazî nayên çareser kirin û di encama tûndiyê de wê gelek pirsgirêkên cuda derbikevin.
Di vê malbatê de civakbûyîn nîne û têkiliya wan bi hevre seqet e. Mêr rêz nade hevjîn û keçên xwe û her tiştî layiqî wan dibîne. Ew jî her tim bê dengin. Çima bê dengin? Sedem ol û zagonên civaka zayendperest e. Jinê fêr dikin ku mêr taca serê wê ye, pîroze û divê ew her tim xizmeta mêr bike. Di mejiyê jinê de diçînin ku mêr hêz e û jin zeyîfe, yê parastina jinê bike û pêdiviyên jinê pêkbîne mêr e. Eger jinek bav, bira yan jî hevjînê xwe rexne bike her kes êrîşî wê dike û wê sûcdar dikin. Eger pirsgirêk di malbatekê de hebe hîna fêmnekirine dixin sukra jinê de. Ji xwe jina ku bertek jê derbikeve yan jî dengê xwe bike mîna ku guneh kiriye û wê tînin rewşa ku ji xwe şerm bike.
Li hemberî feraset û nêzîkatiyên ji jin re têne kirin, tenê perwerde û xwe birêxistin kirin çareserî ye. Anceq jin bi rêxistinkirinê xwe biparêze û bibe xwedî vîn. Jina xwe birêxistin bike wê bikaribe bibe xwedî helwest jî. Mêr tucarî zîhniyeta xwe şaş nabîne û nade guhertin, ji ber vê yekê jina xwe radestî mêr bike wê her tim mehkûmî binkeftinê be.



# Hestnivîserê kurd Bawercan Arî

Helbestvan Bawercan Arî, ji asîmanê wêjeya kurdî stêrke geş e. Ew ji salên 2000'î ve di berhemdayîna helbesta kurdî bi terzê nûjen û kilasîk de helbestan dinivîsîne. Her wiha nêzî hezar helbestên Arî hene û hîna jî pênûs, hest û xeyalên wî ranewestiyane.

**Navenda Nûçeyan**

Helbestvan ew kesên xwedî hestên nizm in, gotinê wan bi awaz in û ramanên wan kûr in. Lê belê her helbestvanek xwedî rêbaz, jîrbûn û asteke wêjeyî ya cuda ye. Ji van helbestvanan jî helbestvanê kurd Bawercan Arî ye.

**Jiyana wî**

Navê wî Ebdilezîz Hecî Elî ye, navê civakî Ezîz e û navê hunerî Bawercan Arî ye. Ew di sala 1961'ê de li gundê Silinder yê girêdayî Amûdê çavê xwe li jiyanê vekiriye. Xwendina xwe ya seretayî li gundê Axirzeman yê nêzî gundê xwe diqedîne. Piştre diçe Amûdê û xwendina navîn li wir didomîne. Her wiha Ezîz Elî bi malbatî diçe bajarê Hesekê û li wir bi cih dibe. Ezîz Elî xwendina xwe ya amadeyî li Hesekê diqedîne û ji ber ku beşa ola islamî jê re derdikeve, riya xwendinê radiwestîne. Jê bi şûn ve êdî dirawstgeha tirênê ya Hesekê de kar dike û nêzî 30 salan tê de xebitiye. Piştre di destpêka salên 1980'î de dest bi xebata siyasî dike. Di sala 2000'an jî dest bi nivîsîna helbestê kiriye. Di sala 2023'an de ew ji bajarê Hesekê piştî ber bi gundê xwe ve vedigere. Di heman demê de ji sala 2019'an ve ew endamê Mecilsa Gelan a Rêveberiya Xweser e. Her wiha di sala 2022'an de tevlî xebata ragihandinê dibe û weke pêşkêşvan di Ronahî TV de salekê kar dike.



**Xebata siyasî, civakî û rewşenbîrî**

Di heman demê de ew di sala 1981'ê de tevlî partiyeke komînîst dibe, 6 salan xebata siyasî dike û di encamê de xebata siyasî ya wê partiyê radiweste. Sedema rawestandina xebata partiya komînîst ew bû ku Ezîz anî ser ziman ku wê partiyê ti xebateke berbiçav ji bo doza gelê kurd û Kurdistanê nedikir. Piştî lêgerîneke ya bi armanca azadiya gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê, di sal 1988'an de Ezîz Elî tevlî Tevgera Rizgariya Kurdistanê dibe. Ji wê demê heya sala 2000'î ew li Rojavayê Kurdistanê, di nav ERNK'ê(Eniya Rizgariya Netewî ya Kurdistanê) de xebtiye. Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re êdî hîn bêhtir rê li pêşiya xebata siyas, çandî û civakî vebû û xwe berda kûrahiya tevgera şoreşgerî û civakî. Hêjayî gotinê ye ku ew di sala 2012'an de tevlî koma Laleş ya hunerî ya bajarê Hesekê bûye û tê de zêdeyî 3 şanoyan bi komê re pêşkêş kirine. Piştre Ezîz di Akademiya Civaka Demokratîk de dibe weke perwerdekarê siyasî, civakî û hem jî rêveber. Wî li kantona Cizîrê ji sala 2013'an heta sala 2023'an civak perwerde kiriye. Di encama vê xebata di nav Akademiya Civakî de bi rêheval û hejmarek rewşenbîran, rewşenbîrên kurd li hev kom kirin û Yekîtiya Rewşenbîran damezrandin. Ezîz jî tevlî Yekîtiya Rewşenbîran bû û heya niha endamê wê ye.

**Kengî arazoyên nivîsîna helbestê li cem Bawercan Arî destpê kir**

Ji destpêka temenê zaroktiyê ve Bawercan Arî ji helbesta kurdî ya kevnar hez kiriye. Di rabirdûyê de çavê wî li deryaya helbesta kurdî bû, lewma hertim li mirovekî digeriya ku helbestên kilasîk jê re bibêje. Ji ber ku bavê wî helbestên Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Seydayê Tîrêj û hwd… bi awaz digotin, Bawercan jî bi hest û canê xwe bi wan helbestan ve dihat girêdan. Di heman demê de jî ew li ser deng û awazên stranên Mihemed Şêxo, Mihemed Arifê Cizîrî, Seîd Yûsif û hwd… mezin bûye. Lewma jî hezkirineke mezin ji bo helbestê li cem Bawercan Arî ava dibe. Di sala 2000'î de jî dest bi melevaniya li nav deriyaya helbestê dike. Wî bi tîpê sormancî ango tîpê erebî dest bi hûnandina raman û hestên xwe kir. Sedem ji vê yekê, ji ber ku tevahiya helbestvanên kilasîk yên weke Cizîrî, xanî û hwd… yên ku ketibû bin bandora wan bi tîpên erebî helbest dinivîsandin. Bi destpêkirina Şoreşa 19'ê Tîrmehê re, Bawrercan xwe fêrî Kurdiya latînî dike û hemû helbestên ku bi tîpên erebî nivîsandine, veguherandine kurdiya latînî.

**Helbest li cem Bawercan Arî û berhemên wî**

Nivîsîna helbestê riya herî bijartî ye ji bo Bawercan Arî, hemû derbirînên veşartî, tîbûna can tev dikevin erkê pênûsa wî. Lewma jî dema ku hest li Arî kom dibin radhêje lênûs û pênûsê. Di destpêka ku wî rahişt pênûsê, wî jixweberiyekê dest pê kir, ne di hizr û ramana wî de bû ku bibe helbestvan. Lê hin bi hin bi aliyê helbestê ve hate kişandin, êdî wî bi dilekî şewat raman, hest, girî, êşa hundirê xwe, ya civak û welatê xwe kirin mijara nivîsîna helbestê. Lewma jî heta niha nêzî hezar helbestên bi mijarên cihêreng, bi terzê helbestnivîsîna kilasîk û nûjen ên wî hene. Her wha hin hunermendên kurd û komên hunerî nêzî 10 helbestên wî kirine stran. Ji navdartirîn helbestên wî yên ku bûne stran; stran a ku Hunergeha Welat bi navê Em Herin Gund çêkir. Ev berhem dengvedanek li ser asta Kurdistanê veda. Sedem jê ew bû ku helbestvan Bawercan Arî tê de jiyana xweş ya gundan vegotiye. Helbestvan Bawecan Arî xwedî hestekî naz û xeyalekî berfirehe, li gorî ji me re da eşkerekirin, nêzî 10 dîwanan ji helbestên wî derdikevin. Lê ji ber rewşa wî ya aborî û kêmderfetî, Bawercan Arî nikare dîwanan çap bike. Tevî wiha jî heya roja îro ew bi temenê xwe yê 53 salî, hîna helbestan dinivîsîne, ne hest, ne raman, ne aso û ne jî pênûsa wî rawestiyaye.

# Dildarê pênûs û helbestê Ebdulrehman Mihemed

**Dîlan Mulhim/Qamişlo**

**Helbestvanê kurd Ebdulrehman Mihemed, wekî gelek helbestvan û nivîskarên kurd yên navdar, di jiyana xwe de gelek êş û azar dîtiye, lê bi dildariya helbest û pênûsa xwe tevahiya zehmetî derbas kirin û berhemên giranbuha pêşkêş kirin.**

Ebdruhman Mihemed di sala 1965'an de li gundê Elawî yê girêdayî bajarê Hesekê ji dayîk bûye. Wî xwendina xwe ya seretayî li gund qedandiye, piştire ji bo berdewamiya xwendina xwe, berê xwe da bajarê Qamişlo û qonaxa navîn ji xwendina xwe li Qamişlo di 1985'an de bidawî kiriye. Herwiha piştî nêzî bidawîbûna xwendina wî ya qonaxa navîn, careke din vedigere gundê Elawî. Piştre di sala 1992'an de careke din vedigere bajarê Qamişlo û jiyana xwe ji wê demê û heya niha li Qamişlo berdewam dike. Ebdulrihman di van salên dûr û dirêj de gelek kar û xebat dane meşandin, di deman niha de jî li kêleka xebatên xwe yên nivîsê, karê rojnemegeriyê jî dike, herwiha di Yektiya Rewşenbîran ya kantona Cezîrê de jî cihê xwe digre.

**Ebdulrehman Rojnameya Ronahî û Yekîtiya Rewşenbîran mîna ronahiya xwe dibîne**

Ebdulrehman Mihemed weke her nivîskar û helbestvanekî kurd gelek êş û azar li pêşberî jiyana xwe dît. Ew jî ji wan nivîskarên ku jiyana xwe bi xizanî derbas kiriye, pariyê nanê xwe bi zorê peyda dikir. Herwiha dibistana ku Ebdulrihman xwendina xwe ya seretayî lê xwendiye 3 km dûrî gundê wî Elawiyê bû, lewra çûn û hatina dibistanê ji bû wî gelekî zor bû, bi taybet di demsala zivistanê de û gundewarên derdora gundê wî hemû pêkhateyên ereb bûn. Ebdulrehman da ku xwendina xwe berdewam bike, tevî birayê xwe, berê xwe dan bajarê Qamişlo û 6 salan li Qamişlo di xaniyê kirê de jiyan kirin, helbet ev jî zehmetiyek bû ku kesek bê dê û bav, bi tena xwe bi temenekî 12 salî li bajarekî mezin bijî. Ebdulrehiman di xwendin û nava hevalên xwe de kesekî serkeftî û jîr bû, di heman demê de meraq û hizkirina wî ji xwendin û nîvisandinê re hebû, lewra di 1999'an de dest bi nivîsandina helbest û xwendina pirtûkan kir, lê di destpêkê de mîna her nivîskarekî, wî nivîsên xwe bê wate ditîn, lê dema ku bi derdora xwe re parve dikir her kes bi wan nivîsan kêfxweş dibûn, ev yek jî kelecan û moralekî berdewamiyê li cem wî dida avakirin, bi nivîsandina helbest û pirtûkan jî mamosteyên wî bi wî re dibûn alîkar. Bi derbasbûna demê re, Mihemed di sala 1999'an de tevlî pêşbirkekê li bajarê Qamişlo bû û di pêşbirkê de asta duyemîn bi dest xist, ev jî kêfxweşiyeke mezin di dilê wî de da avakirin. Ebdulrihman li kêleka pêşbirkan jî, bi vexwendin tevlî gelek festîvalan bûye. Mihemed di salên 2012 û 2013'an de Rojnameya Ronahî naskir û di sala 2014'an de tevlî karê rojnemegeriyê ê di Rojnameya Ronahî bû, di vî karî de nivîsa xwe deha bêtir xurt kir, lewra Rojnameya Ronahî û Yekîtiya Rewşenbîran ji Ebdulrihman re mîna riya ronahiyê bû. Mihemed nivîsên xwe di ware dîrok, kevneşopî, çîrok û helbestan de, dinivîse.

**Berhemên Ebdrûhman Mihemed**

Ebdulrehman Mihemed 4 berhemên xwe bi zimanê erebî çap kirine, rêzdariya wî ji zimanê erebî re heye, lê li kêleka zimanê erebî jî dixwazên wî hebûn ku wan berhemên xwe bi zimanê kurdî jî binivîse û çap bike, lê ji ber nebûna derfetan ev yek pêk nehat. Ji ber di dema ku hînî zimanê erebî dibû, zimanê dayikê ku zimanê kurdiye, ji aliyê Rejîma Baas qedexe bû. Di heman demê de 4 pirtûk jî nivîsandine, 2 jê helbestin navên wan jî helbestan Evîna Menûha û ya din Wedai El-Nasik Elexîr, herwiha herdu pirtûkên din jî kurteçîrokin ew jî berî 5 salan hatine çapkirin. Ebdulrehman ji her 4 pirtûkên xwe, herî zêde kêfa wî ji pirtûka Wedah li Nas Elexîra ye, ji ber ku di vê pirtûkê de li ser kurtejiyan, rol û bandora 94 kesyetên kurd e, ev kesayet jî bandora wan li ser gelê Kurdistanê heye û di pêşgotina pirtûkê de wiha nivîsiye "wefedariyekê ji van kesanên kurd re.



**'Em hene û em li vir in'**

Ebdulrehman Mihemed di dema nivîsê de, êş û azarê miletê xwe hîzdikir, di heman demê de li ser gelê kurd û Kurdistanê jî nivîsandiye. Herwiha di helbest, çîrok û pirtûkên xwe de li ser êş, koçberî, kevneşopî, hezkirin û welatê xwe nivîsandiye. Di helbestê de nekarîbû her tiştî binivîse, lê di çîrokê de dinvîsandin, navê wan çîrokan jî "Bîranînên Kesekî" ev çîroka wî ya sereke bû û li ser wê di mehrecana Osman Sebrî de xelata duyemîn wergirt, naveroka vê çîrokê jî li ser koçberiya gelê wî piştî şoreşa Rojava bû, 2 çîrokên din jî li ser berxwedana li Kobanê û bi taybetî li ser lehengiya jinê di warê berxwedanê de bûn, herwiha li ser zarokatiyê û çanda berê jî nivîsandiye. Ebdulrehman ji bilî nivîsandina helbest, pirtûk û çîrokan, gotaran jî bi zimanê erebî dinivîsîne. Bi riya van nameyan ji cîhanê re dide eşkerekirin ku 'em hene û em li virin'.

**Têbînî**



**Nifşên wêjeyî.. nakokî lê rêzgirtin.?**

Kemal Necim

Di hemû qadên jiyanê de carê nakokiyên di navbera nifşên mirovan de rû didin, ev nakokî dibe ku der barê şêwe û awayên jiyanê debin, yan der barê nêrîn û boçûnên bîrodozî û ramyarî bin. Ji nava qadên ku pêwîste bêtir dostane û têgihîştî be, qada wêje û afirînerîyê ye. Di vê qadê de jî pir caran tengezarî û arîşeyên derûnî di navbera nifşan de derdikevin, di navbera nifşê mezin û xwedî ezmûn, û nifşên ciwan û destpêkê ku gavên xwe yên pêşî li ser rêya wêjeyê û afirîneriya peyvê davêjin de.
Nifşê wejeyî çi ye?... Li gorî hin pênaseyan ew kom yan nifşê daner û nivîskaran ê ku hin bîrwerî û baweriyên bîrdozî û şêwazên hunerî di demeke diyarkirî de wan dighîne hev e. Ev dem jî dibe ku 15 sal yan zêdetir bin. Taybetmendiya koma nifşê wêjeyî ew e ku, ew kesên bi temenê xwe nêzî hev in, kesên ku bîr û bawerî û boçûnên wan yên ramyarî û jiyanî û civakî nêzî hev in, bi hev de re dijî, yan jî bi hev re bûyereke dîrokî civakî yan siyasî yan ramyarî ya bi bandor derbas kiribin.
Hin ramyar û zanyar dibêjin ku nakokiya nifşên wêjeyî diyardeyeke sosyokulturî ye, ev nakokî dema raman û şêwazên wêjeyî di navbera du an çend nifşên wêjeyî yên cuda de têne guhertin çêdibe, bi giştî di navbera nifşê kevin û nifşê nû yê nivîskar û rewşenbîran de çêdibe.
Ev nakokiya wêjeyî ya di navbera nifşan de bi sedema veguhertinên serdemê pêk tên, ji ber ku wêje jî bi guhertinên civakî û çandî bandor dibe, ev guhertin dibe sedema guhertina mijar û awayên nivîsandinê û nirxên wê yên bedewiyê di navbera nifşên cihê de. Nakokî dibe ku ji ber guhertinên ziman û bikaranîna wî ya di navbera nifşan de çêbibe, ev jî bandorê li şêwaza nivîsandinê û nêzîkatiyên rexneyî yên li berhemên wêjeyî dike.
Ta niha, di civaka wêjeyî ya Kurdî de diyardeyeke wiha bi bandor rû nedabû, ango me nebihîstibû ku genşeyek yan nakokiyek di der barê mijarên wêjeyî û şêwe û nêrînên hunerî de di navbera nifşên wêjevanan de rû daye. Carna hin nakokiyên wiha di navbera heman nifşî de rû didan, ew jî bi bandora guberînên ramyarî yên cîhanê çêdibû. Guherînên ku salên dawiyê li Rojava çêbûn, rê li pêşiya beşdarûneke berfereha ya ciwanan vekir di qada wêjeyî de, bi taybet nifşên ku ji dibisitan û peymangeh û zanîngehên Kurdî derçûn û têra xwe agahdarî wêjeya Kurdî bûn û her wiha agahdarî şêwe û derbirînên nû yên afrêneryê bûne. Ev nifş di hêla wêjeyî de guherîn û afrêneriyeke cuda û nûjen çêdikin. Di dema nêzîk de bi rêya pêşbirkeke di warê helbestê de nifşên cuda yên afrêner û daneran hatin kêleka hev û li hember hev. Di encamê de sê xelatên pêşbirkê bûn para helbestvanên ciwan. Lê vê encamê bi xwe re nakokiyek derxist ku piraniya kesên nerazî bûn ji nifşên helbestvanan ên mezintir bûn.
Her çiqas navê vê rûdanê nakokî be jî, lê li gorî pêşveçûna demê diyardeyeke baş e, dê bibe sedem ku der barê awa û şêweyên afrêneriya wêjeyê de geneşeyên berfereh çêbibin, di encamê de dê her nifştek karibe nirx û baweriyên xwe biparêze û rêzê bide nirxên nifşê din.

# 'Ji bo avakirina xwendekarên aktîv û xwedî zanist gavên mezin tên avêtin'

Hevseroka Desteya Perwerdê û Hindekariyê li Kantona Efrîn û Şehbayê Heniya Kalo diyar kir ku li kantona Efrîn û Şehbayê Desteya Perwerdeyê sala xwendinê ya nû bi hêz û vîneke mezin xwendekarên xwe pêşwazî dike.

**Zana Roj/ Şehba**

Desteya Perwerdê û Hindekariyê li Kantona Efrîn û Şehbayê bi hatina sala nû ya xwendinê 2024-2025 deriyên dibistanan vekirin û xwendiekar dest bi gavên destpêkê yê xwendinê kirin. Girêdayî rewşa herêmê û amedekariyên Desteyê ji sala xwendinê re bi giştî li Kantona Efrîn û Şehbayê Hevseroka Desteya Perwerdê û Hindekariyê Heniya Kalo pirsên rojnameya me persîv dan.



**1-Di sala nû ya xwendinê de hûn weke deste çiqas amede bûn di pêşwazîkirina xwendekaran de û heyanî niha hejmara dibistan û şagirtan çiqas e?**

Di oxira mezinkirina şoreşa zimanê dayîkê de bedelên giran û buha hatin dayîn da ku em bigihînin vê astê. Çima em dibêjin perwerde û ziman helbet ji ber Ziman hêman û nasnameya yekemîn ya kombûna civakan e. Li ser vê esasî xwe perwerde dike û pêşxistinê di civakê de dide avakirin. Me jî deriyên sala xwendinê ya 2024-2025'an vekirin, bê guman zehmetî û nebesiyên sala par hebûn, ji ber rewşa herêm û cografiya ku em tê de jiyan dikin hinekî cuda ye. Helbet ji bo pêşwazîkirina sala nû li gorî derfetên di destên me de me xwest em hin guhartinan di dibistanan de bidin avakirin. Di encama şerên giran yên ku herêma Şehbayê tê re derbas bûbû, hejmareke mezin ji dibistanên me kaxil bûn û hinek jî nîv rûxandî bûn, her wiha hin dibistanên me ji ber rewşa herêmê mal bûn ne dibistan bûn, her wiha hin pelçîmkirin, çêkirina derî û pencereyan, anîna daniştekan û boyax kirina dibistanan hebûn. Ev kar di aliyê xizmetguzarî de ji bo pêşwazîkirina xwendekaran di dibistaneke xweşik û boyaxkirî de tê de xwendina xwe bikin de; hatin kirin. Ji be em bixwazin nexwazin cihê ku şagirt tê de dixwînin bandoreke mezin li ser derûniya şagirt dike, li cihê ku dibistaneke wêrankirî de fêrî zanistê bibe, me hewil da em vê yekê piştî 7 salan ji koçberiyê derbas bikin. Bi taybet dibistaneke me li navçeya Fafînê hebû bi rastî ne cihê xwendinê bû, di zivistanê de pir zehmet bû, her wiha di tewriya fêrbûnî de deng û tevgera şagirtan bandor li ser refan dikir, ji lewra bi temamî weke avahî hate nûkirin. Bi giştî piştî çeksazkirina hin dibisatan 61 dibistan hene û hejmara xwedekarên ku heyanî niha xwe tomar kirine 13 hezar xwendekar e.

**2-Xwendekar li ser çi bingehê têne perwerdekirin û pilansaziyên we di betlaniyê de ji bo mamosteyan çi bûn?**

Belê, niha li gorî modêla Rêveberiya Xweset û sîstema modernîteya demokratîk ji bo avakirina kesayetekî xwendekar ya aktêv û xwedî zanist, di sala par de sîstema nirxandinê hate pjirandin û kete meryetê, bê guman weke modêleke nû û cara yekemîn di cîhanê de xwendekar li ser esasê jêhatîbûn û nirxandinê wê derbasî ezmûnan bibe û bi ser bikeve tecrûbeyeke nû bû û ji bo malbat û xwendekaran hinek zehmet bû. helbet armanca ji vê yekî ne ku em giraniyê bidin ezberbûnê û em derbasî ezmûneke ku çarenûsa xwendekar diyar dike bikin, armanc ew e ku em asta têgihîştin, analîz û kêkolînê li gel xwendekar xurt bikin, xwendekarên me jî wê îsal bi derbasbûna mînhaca nû re wê li ser vê esasê bêne nerwede kirin.
Di aliyê mamosteyan de jî ev weke gaveke nû bû, di destpêka batlaneyê de akedemiyên taybet ji bo vê sîstemê hatin vekirin, her wiha rêziknameyên dibistanan, felsefeya xwendinê, erk û pîvanên mamoste û xwendekaran çi ne hatin dayîn.
Ji bo ku sîstema nirxandinê tam bê rûnişkandin, û perwerdeya xwendekar tenê li ser mile mamoste û şagirt nemîne, di sala nû de meclîsa malbatan wê bêne avakirin. Armanc ji vê yekê ew e ku malbat xwe li hemb er perwerdekirina zarokên xwe; xwe berpirisyar bibînin. Di her navşeyekê de wê ev meclîs bê avakirin û ji wan malbatan wê du berdefkên wan derkevin tevlî meclîs ango komêna dibistanê bi mamosteyan re bibin. Tê de wê nîqaş, rexne û nêrînên xwe bi fermî bidin.

**3-Li rex dorpêç û êrîşên dagirkeriya Tirkiyê, xwendekarên Efrînê zêdetirî 6 salan ne bi îsrar perwerde dibin, hûn vê salê çawa dinirxînin?**

Belê, rewşa herêmê di aliyê leşkerî û jiyanî de ber bi çav e, her ku temenê koçberiyê li vir dirêjtir dibe jiyana gel jî zehmetir dibe. Bi taybet êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên ku rojane sivîl û herêmê bi gelemperî digire hedef bi hovane tên berdewam kirin. her wiha dorpêça Hikumeta Şamê ya ku hemû aliyên jiyanê û derfetên gel astangdar dike, bi serê xwe siyaseteke ji bo têkbirina îradeya gelan ya ku ji 7 salan ve tê berdewamkirin. Bê guman ev hemû bandora xwe li ser derûnî û kesayeta xwendekar dikin, lê belê îsal bi taybet ev bû 3 heftene dibistan hatine vekirin, bi rastî jî dema em derbasî dibistanan dibin em hêza îradeyê û vîna hezkirina ji zanist û xwendinê re di rêûresmên rûyê wan de dibînin.
Bi xwendina Sirûda ey Reqîb tê dîtin ku rûxmî hemû êş û şertên zehmet yên jiyanê çiqas bi hêz û hezkirin in ji bo biserxistina şoreşa zimanê dayîkê, soz dana şehîdan û şoreşê ku ewê di vê xetê de berdewam bikin, bi kurtasî mirov dikare vê bibêje amedebûna wan berdewamkirina têkoşînê ye.

**4-Zehmetiyên bingehîn yên ku hûn weke desteya perwerdê rû bi rû pê re dimînin çi ne?**

Bi rastî weke desteya perwerdê di aliyê peydakirina pêwîstiyên dibistan û xwendekaran de em bi zehmetiyên mezin re rû bi rû ne. herêma Şehbayê ne xwedî derfeteke ewqas mezine ku çapxaneya wê hebe da ku em pirtûkên nû ji xwendekaran re çap bikin. Bi avakirina hin guhartinan di minhaca xwendinê ya refa 1-4-7- 10 de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, sala par ji ber dorpêç û siyaseta Hikumeta Şamê me nikarî ew pirtûkên nû derbasî herêmê bikira, ji lewra em mecbûr man li gorî mînhaca ku di destê me de em fêrbikin. Bi giştî hejmara pirtûkan li herêmê pir kêm e, mamoste waneyan dide xwendekar û xwendekar jî bi riya nivîsandinê wane û mabetên xwe dixwîne û xwe amede dike. Lê ev yek ne mumkîne wisa bê berdewam kirin, ji ber hebûna pirtûkê di destê xwendekar de cudayî ku tenê ji tiştên di dibistanê de wergirtine bixwîne.
Di aliyê rewşa malbatên me de, her sal em hewildidin ku qirtasiyên xwendinê li ser xwendekaran belavbikin. Ev qirtasî bi zehmetî tên peydakirin û derbaskirin. Îsal heyanî niha hêj derfet nehatiye peydakirin ku em pêwîstiyên xwendekaran di aliyê qirtasiyan de peyda bikin. her wiha ji ber teybetmendiya herêmê û rewşa gel sîstema Yek Cil li ser xwendekarên Efrînê nehatiye ferizkirin.
Her wiha di milê pêwîstiyên dibistan û fêrgehan de heman pirisgirêk û astengî hene, li herêmê kargehên ku pêwîstiyên xwendinê amede bikin nîn in, dema em bixwazibin van pêwîstiyan derbasî herêmê bikin, dewlet yekser dibe asteng û nahêle ku derbas bibin. Ji ber van siyaset û polîtîkeyan em bi zehmetiyên wisa re her sal dimînin.

**5-Peymangeha Şehîd Viyan Amara ji sala nû ya xwendinê re xwe çawa Amed dike, fakulte û hejmara xwendekarên wê çiqas e?**

Di herêmê de yek peyamngeh hatiye vekirin ew jî ya Ş. Viyan Amara ye, peymangeh bi fakulteyên xwe yên weke (mamostetiya refê, Wêje û zimanê Kurdî, bîrkarî, Wêjeya Erebî, fîzîk û kîmiya û zimanê Îngîlîzî) tê naskirin. di sala par de 57 xwendekarên peymangehê derçûn û di dibistanên herêmê de dest bi mamostetiyê kirin. îsal wê di heyva 10 de deriyên xwe vebike û heynê niha zêdetirî 200 xwendekar hatine tomar kirin û li gorî wê amedebûyîn tê kirin. Îsal yek ji pirojeyên me ew bû ku em beşa Bîrkarî li ser zêde bikin, heyanî niha hejmareke baş xwendekara xwe tê de tomar kirine.

# Ji ber dorpêçê li depoyan derman ji sedî 30 kêm bûne

**Navenda Nûçeyan**

**Piştî dorpêça 4 mehan a hikumeta Şamê, li 150 depoyên dermanan ên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derman ji sedî 30 kêm bûne. Dermanên şekir û tansiyonê bi zorê peyda dibin û hikumeta Şamê wan dermanan tenê li navendên xwe yên çargoşeyên ewlehiyê difiroşe.**

Li dermanxaneyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê vê dawiyê gelek cureyên dermanan kêm bûne. Nexweşên şekir û tansiyonê di peydakirina wan de zehmetiyan dikişînin. Ev 4 meh e hikumeta Şamê nahêle derman derbasî herêmê bibe ku dem bi dem dorpêçê li ser herêmê ferz dike. Hevserokê Yekîtiya Dermanfiroşan a Qamişloyê Kamîran Mecdel Beg girêdayî vê yekê got: "Derman kêm in, em di peydakirina gelek cureyan de zehmetiyan dikişînin. Derman di depoyan de heyî heta 6 mehan têrê dikin. Lê dermanên şekir, tansiyonê û yên çavan tune ne."



Li gorî Mecdel Beg li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 150 depoyên dermanan hene. Lê ji ber ku derman nakevin herêmê, li van depoyan derman ji sedî 30 kêm bûne.
Hikumeta Şamê nahêle derman derbasî herêmê bibe û li navendên xwe yên li çargoşeyên ewlehiyê difiroşe. Mecdel Beg diyar kir ku hikumeta Şamê ji ber sedemên siyasî dermanan li ser herêmê qut dike. Her wiha Mecdel Beg da zanîn ku hin cureyên dermanan bi rêya ajansên dermanan diketin herêmê lê buhayên wan ji yên li Heleb û Şamê cuda bûn û wiha domand: "Niha bi rêya bazirganan dikevin herêmê, ji ber wê her dermanfiroşek bi buhayekî difiroşe. Ji ber ku li herêmê kargehên dermanan kêm in û dermanên şekir û tansiyonê tune ne, em neçar dibin dermanan bînin."
Mecdel Beg aşkera kir ku Desteya Tenduristiyê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji sedî 90`ê pêwîstiya herêmê ya dermanan ji herêmên hikumeta Şamê tîne ku kargehên dermanan li Heleb, Himsê û Şamê hene. Mecdel Beg îşaret bi bandora kêmbûna dermanan li ser herêmê kir û got: "Kêmbûna dermanan bandorê li şêniyan û nexweşên şekir û tansiyonê dike. Em li şûna wan dermanên biyanî bi rêya bazirganan ji herêmên din peyda dikin." Mecdel Beg anî ziman ku ji bo peydakirina dermanan hewl didin bi Desteya Tenduristiyê ya hikumeta Şamê re peymanekê îmze bikin.
Li gorî Mecdel Beg piştî 4 mehan û piştî hewldanên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk cara yekê barê dermanan derbasî herêmê bû. Mecdel Beg diyar kir ku her pêşketin an jî geşedanek li Sûriyeyê çêbe bandorê li tevahî qadan dike û wiha pê de çû: "Ji ber wê em xwe ji tevahî rewşan re hazir dikin. Em dermanan depo dikin ku têra herêmê bike. Lê dorpêça berdewam, bandorê li karê me dike. Me gelek caran pêşniyar kiriye ku kargehên dermanan li herêmê werin avakirin. Li hin herêman hewldan hene lê derfetên kêm û hedefgirtina wan ji aliyê dewleta Tirk ve, van hewldanan asteng dikin."
Mecdel Beg di dawiyê de got: "Dibe dewleta Tirk di êrişên xwe yên li dijî herêmê de her kargehekê topbaran û wêran bike. Mînaka herî berçav jî, topbarankirina stasyona oksîjenê ya li Qamişloyê ye. Ji ber êrişên dewleta Tirk em nikarin kargehekê li herêmê ava bikin."



# Malbatên Şehîdan: Malbata Barzanî asta xiyanetê derbas kiriye

Endamên Meclisa Malbatên Şehîdan diyar kirin ku êrişên li ser Herêmê Parastina Medya tên meşandin, kiryarên dagirkirina xaka Başûrê Kurdistanê ye. Herwiha bîbirxistin ku pêwîste pêşmergeyên welatparêz nebin amûra şerê dagirkeriyê.

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Di sala 2021'an de dewleta Tirk ya dagirker li ser Herêmên Parastina Medya êrîşeke dijwar da destpêkirin. Dagirkerî bi alikariya çekdarên PDK'ê hewil dide xaka Başûrê Kurdistanê li gorî peymana Lozanê ji nû ve dîzayn bike.
Derbarê êrîşên li dijî Herêmên Parastina Medya û hevkariya PDK'ê ya dagirkirina xaka Başûrê Kurdistanê, endamên Saziya Malbatên Şehidan Cîhan Gulo û Ebdulilkerim Ebdo ji rojnameya me ra axivîn.

**'Em wek malbatên şehîdan li pey doza zarokên xwe ne'**

Endamê Saziya Malbatên Şehîdan a kantona Cizîrê Ebdilkerîm Ebdo êrişên dagirkirinê yên li ser Herêmên Parastina Medya ku ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker û bi hevkariya PDK'ê tên kirin, bi tundî rexne kir û nêrînên xwe wiha anî ser ziman: "Birayê min şehîd Hogir di sala 1994'an de li herêma Botanê şehid bû. Êrişên li ser Herêmên Parastina Medya tê kirin, armanc qirkirina gelê Kurd e. Li Rojavayê Kurdistanê jî heman êriş tên meşandin. Armanc li her 4 parçeyên Kurdistanê têkbirina deskeftîyên gelê Kurd e. Ev êrişe bi hevre girêdayî ne. Dewleta Tirk dewletekî bê pîvan û bê rêgeze, armanc wan domandina nifşê Osmanî ne. Hewildan dikin ku sînorên demê desthilatiya dewleta Osmaniyan winda kirine bi êrişên dagirkeriyê dîsa paş de vegerîne. Ev êrişê tên meşandin, bihevkariya PDK'ê tên kirin. Em pey tekoşîn û berxwedana zarokên xwe ne û ti cara paş de venagerin. Ev tekoşîna azadiya Kurdistanê sala xwe ya 40'emîn dagirt û berdewam kir dê bikeve lûtkeya serkeftinê jî. Em pêkhateyên ku li herêmê jiyan dikin li dijî van êrîşan bertek didin û têdikoşin. Gelek rayedarên dewleta Tirk ev 100 salin dibêjin em ê gelê Kurd û Tevgera Azadiyê tune bikin. Ev siyaseta dimeşe, ya bi sedan salan e. Ger tunekirinek hebe ya mejiyê dewleta Tirk ya dagirker e. Ev şerê ku niha dimeşe, şerê hebûn û tûnebûnê ye. Bangawaziya me ji bona pêşmergeyên welatparêz û malbatên wane, bila nebin beşekî xiyaneta PDK'ê li gel zarok û hevalên xwe cih bigirin."



Evdilkerim Evdo



Cihan Gulo

**'Xiyaneta PDK'ê digihije astekê metirsîdar'**

Endama Saziya Malbatê Şehîdan a bajarê Qamişlo Cîhan Gulo jî bibîrxist ku dagirkirina Başûrê Kurdistanê de PDK'ê rîsteke xeter dileyize û wiha domand: "2 zarokên min berdêla rojên azad de şehîd bûne. Li Herêmên Parastina Medya ev demeke êrişên dagirkeriya Tirk yên dijwar tên meşandin. Bi hevkariya çekdarên PDK'ê li herêmên ku gerîlayên azadiyê tê de dimînin de êrîşeke hovane dimeşînin. PDK'ê alikarî dide dewleta Tirk ya dagirker ji bona xaka Başûrê Kurdistanê bê dagirkirin. Malbata Barzanî û PDK'ê asta xiyanetê derbas kirin. Birayekî min jî di şerê xiyanetê de şehid bû. Gelek keç û xortên Kurdistanî bi destê PDK'ê hatin şehid xistin. Yusuf Gulo û zarokek min û zarokê birayê min jî, welatparêzên ku bi destê xiyanetê hatine şehid xistin. Ez wek keça Apê Yusuf heya lûtkeya serkeftinê li hemberî xiyanetê tekoşîn bikim. Em wek welatiyên Rojava şagirtên Rêber Apo ne, em ti cara nahêlin dagirkerî û xiyanet li pêşiya deskeftiyan bibe asteng."

**'Pêwîste malbatên Pêşmergeyên Roj banga vegera zarokên xwe bikin'**

Cîhan Gulo wisa axiftina xwe qedand: "Em bangawazî malbatên çeteyên bi navê Pêşmergeyên Roj dikin, zarokên we dibin amûra şerê dagirkeriyê. Pêwîste hûn bang bikin ku ji bona zarokên we vegerin Rojavayê Kurdistanê. Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de kar û xebat bimeşînin. PDK'ê sixurê dewleta Tirk ya dagirker e. Em pir caran bûne şahid ku sixurtî derdora çeteyên Roj de tê pêk anîn. Pêwîste wan kiryarên xerab û dijî gel malbat ne pejirînin."

# 'Pêwêste saziyên navneteweyî bi erkê xwe rabin'


**Jîn Hisên/ Qamişlo**

**Endamên Kombenda Efrînê destnîşan kirin ku wekî her carê çeteyên girêdayî dewleta Tirk rêzebinpêkirinên xwe yên derheqê şêniyên resen li bajarê Efrînê berdewam dike û gotin: "Li hemberî sûcên ku li dijî gelê Efrînê pêk tê, pêwêste aliyên peywendîdar berpirsyartiya xwe bi cih bîne."**

Ji destpêka dagirkirina Efrîn ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve, li dijî gelê Efrînê yê resen sûcên dijmirovî tên kirin. Welatiyên ku li Efrîna dagirkirîman rojane bi işkence, revandin, destdirêjî û binçavkirinê rû bi rû dimînin. Dagirkeriya Tirk bi tevahiya şêwazan li dijî Efrînê qirkirinê dide meşandin.

**Bûyera gundê Kaxirê**

Di dema dawî de ji nav rêzebinpêkirinên ku pêk tînin, çeteyên" Sultan Silêman Şah" baca darayî bi mîqdara 8 dolaran ji bo her dareke Zêytûnê ferz kirin, ji bilî bacên Zeytê û yên din. Çend ji şêniyên gundê Kaxirê li navenda leşkerî ya çeteyan vegeriyan, lê di encamê de 2 şênî hatin girtin. Jinan li gundê Kaxirê yê bajarê Efrînê 15`ê Îlonê li hember sûcên çeteyên dewleta Tirk a daigkrer serî hilda û banga serbestberdana kesên hatine revandin kir. Lê çeteyên "Emşat" ên dewleta Tirk a dagirker bi guleyan êrişî jinan kir. Di encamê de 20 kes birîndar bûn ku piraniya wan jin bûn.
Di derbarê mijarê de endamê Kombenda Efrînê Ya Civakê Elî Ebdo ji rojnameya me re axivî.
Elî Ebdo diyar kir ku ji ber îflasbûna ku di nava çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirkiyê de derketiye, çete dest bi ferzkirina bacên daryaî li ser şêniyan dikin û kesên ku red dikin tê îşkencekirin û wiha domand: "Şêniyên gundê Kaxirê hatin dûrpêçkirin ji ber ku baca darayî red kirin, herwiha çend şêniyên gund dema li navenda çeteyan vegeriyan hatin girtin, jinên gund serî hildan li hember vê binpêkirinê, di encamê de êrîş li ser wan hate kirin û birîndar jî di nav wan derketin, Dagirkeriya Tirk li Bakurê Kurdistanê 4 hezar gund şewitandin. Li efrîn jî heman tişt dike. Dixwaze gel qir bike."
Elî Ebdo kiryarên çeteyan bi tundî şermezar kir û wiha pê de çû: "Gerek ev binpêkirina ku li dijî jinên kurd li gundê Kaxirê pêk hatiye neyê qebûl kirin, em daxwaz ji hêzên navnetewî û rêxistinên mafên mirovan dikin ku bêdeng nemîne û van kiryarên dijî mirovahiyê qebûl nekin."
Elî Ebdo wiha got: "Ji mafê her gelekî ye ku bi aştî jiyan bike, em jî weke gelê kurd xwedî dîrok, ziman, çand û xakin, êdî gerek neyê qebûl kirin ku li ser erdê gelekî ev binpêkirin berdewam bibe û dawî li vê dagirkeriya Tirk bînin, ku hewil dide demografiya Efrîn bighurîne ji nasnameya kurdî."
Di dawî de Elî Ebdo bang li gelê kurd kir ku seferberiyê raghênin ji ber ku ev dem fersendeke ku em xaka xwe rizgar bikin, Kurdistaneke Azad û demokrat ava bikin, êdî ji dagrkeran re bêdeng em nemînin, dema bindestiyê bi dawî bûye, dem ya me ye ku em ji koletiyê xelas bibin.
Di heman çarçoveyê de endama Kombenda Efrî a Civakî Fule Henan diyar kir ku qehremaniyeke mezin e û cihê serbilindahiyê ye ku jinên me li gundê Kaxirê li li hember zilm û zordariyê li dijî dagirker û çeteyan serî hiladan, dengê wan gihaşt tevahî cîhanê û wiha domand: "Her mirovek xwedî wijdan gereke bihise ku jinên me li Efrînê û gundewrên wê di bin zilm û îşkenceyan de jiyan dikin. Divê rêxistinên navnetewî mafê van jinan misoger bikin ji çeteyan. Çeteyên girêdayî Tirkiyê şert û mercên zehmet li ser şêniyan ferz dike da ku milet koçber bibe û li şûna wan niştecihan bi cih bike, nasnameya kurdetiya Efrînê bihelîne."
Fule Henan wiha dewam kir: "Dijminê me ji dijminên herî hovin, demografiya herêmê diguherîne, dîroka me îmha dike û tevahiya zagon û pîvanên mirovahiyê binpê dike. Tiştê ku li Efrînê pêk tê mêjiyê mirovan tehmûl nake ji ber kiryarê ku tê kirin."
Fule Henan bang li civata navnetewî dike ku piştgiriyê bidin gelê Efrînê, zilm û dagrkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê li ser erda Efrînê, herwiha tevahî herêmên dagirkirî bi dawî bibe. Vegerandina şêniyan ji herêmê re misoger bikin da ku her kes li mal û milkê xwe vegerin.
Fule Henan destnîşan kir ku bi yekîtiya kurdî ku xwedî giringiyeke mezin e divê pêk bê, wê tevahî kiryarên dagirkeran û pilanên wan yên qirêj li dijî kurdan wê biser nekevin, ji ber vê yekê her dem dijmin fitneyan di nava kurdan derdixîne û şerê me dikin.
Di dawî de Fule Henan berxwedana jinan ku gundê Kaxirê silav kir û got:" Li hember zilm û zora ku ev 6 sal pêk tê li dijî gelê Efrînê, jinan îro serî hildan ji bo mafên xwe. Divê aliyên peywendîdar destwerdanê bikin û berpirsyartiya xwe bi cih bînin. Sûcên dagirkeriya Tirk û çeteyên girêdayî wê bi dawî bikin."



Elî Ebdo



Fule Henan

# Saziya Sîxurtiyê; PARASTIN

Parastin dezgeha îstixbarata girêdayî PDK'ê ya Başûrê Kurdistanê ye. Ev sazî di destpêkê de ji bo armancên cuda hat damizerandin. Lê her ku çû ew bû amûra sîxurtiya dagirkeriyê û têkbirina têkoşîna gelê kurd.

**Argêş Gewda/Qamişlo**




PARASTIN weke dezgehekî karên hûndirîn, ji aliyê PDK'ê(Partî Demokratik Kurdistan) ve tê sazûman kirin. Desteya lêkolînê ya sereke ya girêdayî desthilatiya PDK'ê li Başûrê Kurdistanê ye . Ew niha dezgeheke fermî ye ku piştî hevgirtin û yekkirina dezgehên îstixbaratê a Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) bi navê Parastin hatiye damezrandin. Parastin cara yekem di sala 1967'an de ji aliyê PDK'ê ve hat avakirin. Dema Parastin hate avakirin, Şoreşa Îlonê bû. Parastin wek "Servîsa Îstixbarata Kurdî" hatiye binavkirin. Karê bingehîn ê ajansê vekolîna tawanên girêdayî ewlekariya navxweyî û derve ya Herêma Başûrê Kurdistanê ye. Di aliyê Aborî de dewleta Israilê fînanse dike vê dezgeh ê. Endamên destpekê yê dezgeha PARASTIN'ê ji aliyê endamên MOSSAD'ê yên welatiyên Başûrê Kurdistanê yên ku eslê xwe cihû ne hatin perwerde kirin. Di dameziran-dina dezgehê de, kesayetên weke Mesûd Berzanî û Şekîp Eqrawî cih girtine. Perwerdeya destpekê li Israil hatiye dîtin. Berpirsyarê giştî yê dezgeha PARASTIN'ê Manî Hana Mîran û navenda dezgehê herêma Başûrê Kurdistanê Hêwlerê ye. Peywendiyên wan gel dewletên wek Israil û Iranê jî hene.

**Armanca PARASTIN'ê û hevkariya li gel MÎT'ê**

Armanca damezirandinê ya destpêkê komkirina zanyariyên hundirîn bû. Di şerê desthilatiya Sedam Husên û PDK'ê de zanyariyên hundirin dihatin kom kirin. Welatparêzên wê demê yên ku di nav desthilatiya BAAS'ê de kar dikirin, derheqê tevgerandina artêşa Iraqê û dezgehên ewlehiyê yên girêdayî Seddam Husên de agahî dihatin komkirin. Ev zanyarî wê demê di bin şopandina Mele Mustefa Berzanî û rêveberê dezgehê yê wê demê Mesûd Berzanî de derbas dibûn. Ev zanyarî li hemberî qaseyek pere ji bo Israil û Îranê we dihatin firotin. Dameziran-dina dezgehê de, peywendiyên MÎT û PARASTIN'ê demê destpêkê de, merheleyek mezin de nebû. Dema avakirina Herêma Federe ya Başûrê Kurdistanê de dewleta Tirk ya dagirker raste rast peywendî ne didan avakirin. Ji ber digotin "Di hundirê sînorên me, bi navê Kurdistanê hebûnên cûda napejirînin." Peywendî asta welatên cîran de dihatin meşandin. Di sala 1960 û 1970'an de jî ti peywendiyên asta jor de nehatin pêş xistin. Di sala 1973'an de merheleya peywendiyên xwe li gel dezgeha istixbaratî ya dewleta Tirk ya dagirker MÎT'ê we pêş xistin. 1974'an di bin revebirina Îsa Siwar de di herêma Behdînan peywendî hatin pêşxistin. Di wan dîrokan de giringiyek mezin didan zanyariyên li ser rewşa bajarên Kerkûk û Mûsûlê dihate komkirin. Armanca dewleta Tirk ya dagirker ev bû ku, van peywendiyên ku pêşxistine bikin berjewendiyên pêşxistin û rêxistin kirina MÎT'ê li Başûrê Kurdistanê.

**Propangandaya hevkar a MÎT û PARASTIN'ê ya li dijî Tevgera Azadiyê**

Di salên 1990'î de peywendî bi şewazekî fermî di navbera rêveberiyên her 2 saziyên istixbaratî de hatin meşandin. Mesûd Berzanî di sala 1992'an de li Enqerê li gel Wezîrê MÎT'ê yê wê demê Sonmez Koksal re hevdîtin pêk anî. PDK'ê a Bakur de jî bi nunerên MÎT'ê bi şêwazekî çalak cih girtin. Kûştina Doktor Şivan (Seîd KirmiziToprak) tê payin ku bi destê MÎT û PARASTIN'ê hatiye kirin. Peywendiyên wana ji bona têkbirina Tevgera Azadiya Kurdistanê jî gelek kiryarên hevpar hatine kirin. Bi taybetî bi rêxistina Gladio ya girêdayî NATO'yê ketiye jiyana me û di cîhana îstîxbaratê de rêbazek naskirî ye û gelek caran ji hêla hêzên serdest ve tê bikar anîn. Gelek caran di herêmên Behdînan mirovên welatparêz hatin qetilkirin û Tevgera Azadiyê hemberî wan kiryarên qirêj hatiye tometbarkirin. Di salên dawî de gelek endamên MÎT'ê bi hevkariya PARASTIN'ê xwe Başûrê Kurdistanê tevger dike.

**Hevkariya salên dawî yên MÎT û PARASTIN'ê**

-Şerê taybet , operasyonên veşartî ne ku ji hêla dewlet an dezgehên îstîxbaratê yên girêdayî wan ve têne kirin da ku raya giştî an hêzek din (dewlet, rêxistin, kom, hwd.) provoke bikin an rêzê bidin nişandan û bi vî rengî xuya bikin ku kesên tê navdar armanc bên girtin. Di van çend mehên dawî de hêdî hêdî li hin bajarên Başûrê Kurdistanê bi taybetî li Hewlêrê şewatên mezin bi destê MÎT û PARASTIN'ê hat derxistin. Her çend piştî bûyerê hat ragihandin ku ev şewat bi destê PKK hatiye pêxistin û medyayê girêdayê xwe de ev propanganda hat kirin.

Fazil Mîranî amadekariyên plana ku di civîna MÎT û PARASTIN'ê ya li Dihokê li xwe mikur hat.

-Di çarçoveya amadekariyan de jî cilên gerîlayên HPG'ê 200 kincên gerîla hatin amadekirin. Li gorî plansaziya qirêj, îstixbaratên Tirk bi cil û bergên gerîlayan û hêzên taybet ên PDK'ê dê êrîşî nuqteyên asayîşa giştî û polîsan ên Duhokê bikin. Di êrîşê de wê êrîşeke provokatîf û qetlîamek bê kirin, kesên girîng ên ku derdorên muxalefeta PDK'ê yên Duhokê pêşengiyê dikin, serokên muxalefeta civakî û hin kesên girîng ên Tirkmenan bikin armanc û PKK'ê tometbar bikin. Dewleta Tirk a dagirker ku li Herêmên Parastinê yên Medyayê hem ji bejahî û hem jî ji hewayî derbeyên li dijî Gerîlayên Azadiyê dixwe, di çarçoveya plana MÎT'ê de bi alîkariya îstîxbarata PDK'ê Parastin yekîneyên kontra li Başûrê Kurdistanê ava kir.

- Di 1'ê Pûşber a 2024'an de li navenda MÎT'ê ya Antalyayê civîneke veşartî pêk hat û di civînê de berpirsê MÎT'ê yê bi navê Selîm û wergêrê bi navê Reşîd Hikmet Abid ku yek ji rayedarên PARASTIN'ê û Îsa Keçîn jî amade bûn.

- Di civînê de rayedarên MÎT'ê ji Reşîd Hîkmet xwestin ku di çarçoveya plan û siyaseteke nû de gel di nava "Leşkerên Hemcek" a bi navê "Pêşmergeyên Sînorê Behdînan" de bi rêxistin bike. Ji bo kesên di lîsteya ku bi PDK'ê re hatiye amadekirin de plansazî hat kirin. Cîbicîkarê planê ji aliyê MÎT'ê ve bi navê Reşîd Hikmet ê ku yek ji rayedarên Parastinê ye hat diyarkirin.

- Pêşmergeyên bi navê leşkerên Hemcek ên li herêma Dihokê ku bi pêşmergeyên Sînorê Behdînanê tên naskirin, hat gotûbêjkirin. Hate hînbûn ku mûçe dê ji aliyê Komara Tirk a dagirker ve bê dayîn û mûçeyên wan ên mehane weke 300 dolar hatiye diyarkirin. Hat ragihandin ku dê ji her pêşmergeyekî re kalaşnîkovek, 4 jarjor û 4 bombe bên dayîn.

- Pêşmerge dê cil û bergên gelêrî yên kurdî (şal û şapik) li xwe bikin. Pêşmerge dê li baregeha leşkerî ya dewleta Tirk a dagirker a li Bamernê ji aliyê Pêşmerge û fermandarên Artêşa Tirk ve werin perwerdekirin. Erka wan parastina nuqteyên artêşa Tirk ên li ser xeta Dihokê ye û di şerê artêşa Tirk a dagirker a li dijî Gerîlayên Azadiyê de li eniya pêş şer bike.

# Nêzîkbûna Tirkiyê-Sûriyê û asta bandora wê li ser rola kurdan li Rojhilata Navîn

**Kawa Nader Qader**

Peywendiyên di navbera şefê faşîst, Recep Tayyip Erdogan, û hevkarê wî Beşar Esed, piştî 13 salên aloziyên di navbera wan de, dibin şahidê guhertineke mezin. Di destpêka şerê navxweyî ya sala 2011'an de, Erdogan serokomarê niha yê Şamê, wek "terorîst" bi nav kir û hewl da ku Sûriyê dagîr bike. Lê niha, em hewldanên wî yên ji bo sererastkirina têkiliyên her du welatan dibînin. Ev nêzîkbûn di serî de li ser Kurdên Rojava û bi taybet Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) û Herêma Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê ku di şerê li dijî DAIŞ'ê de ji aliyê DYA û welatên hevpeyman ve tê piştgrî kirin.

Tirkiye van hêzan wek beşek ji Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) dibîne û wek metirsî li ser yekparçeyiya axa xwe dibîne. Ev rewş di nav Kurdên Rojava de li ser lihevhatineke muhtemel a di navbera Enqere û Şamê de guman çêdike, ji ber ku her du jî, ye, hevalbendiya bi Esed re rêyek dibîne ku meşrûiyeta xwe ya siyasî xurt bike. Bi nîşandana xwe wekî parêzvanê ewlekariya niştimanî ya Sûriyê, hewl dide bandora Kurdan li herêmê kêm bike. Ji aliyê xwe ve, Esed hevkariya bi Tirkiyê re weke rêyek ji bo bihêzkirina pêgeha xwe di danûstandinên aştiyê de dibîne.


Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê wekî dijminekî hevpar dibînin.

**Faktorên Polîtîk û Hêzên Stratejîk**

Ruxmê nakokiyên berê yên di navbera Tirkiye û Şamê de, rewşa heyî aliyên beşdar neçar dike ku ji nû ve helwestên xwe binirxînin. Kurdên ku li Rojava rêjeyek federalîzmê bi dest xistin, bûn hêzeke leşkerî û siyasî ku nayê paşguhkirin. Ji ber vê yekê, Erdoğan û Esed hewl didin xebatên xwe yên rûbirûbûna wan zêdetir bikin. Erdoğan ji ber zexta navxweyî ya li ser aborî û koçberiyê rû bi rû

**Pîvanên Herêmî û Navneteweyî**

Nêzîkbûna Erdoğan û Esed beşeke ji guhertineke berfirehtir di siyaseta herêmê de. Hêzên herêmî û navneteweyî hene ku dixwazin hevsengiyên Rojhilata Navîn biguherînin, wek Rûsya û Îranê. Peywendîyên di navbera Tirkiye û Rûsyayê de nebaş bûn; hevkariya li dijî Kurdan dikare di peywendiyên xwe yên bi Moskowê re zêdetir hêz bide Tirkiyeyê. Ji aliyê din ve, rista Îranê, pirsgirikek din e. DYA ku bi giranî piştgirî daye Kurdan di şerê li dijî DAIŞê de, eger nêzîkbûnek di navbera Enqere û Şamê de çêbibe, dibe ku di siyaseta xwe ya li herêmê de rastî pirsgirêkên nû bên.

**Danûstandinên Metirsîdar**

Eger ev nêzîkbûn çêbibe, Kurd li Rojava wê rastî encam û zehmetiyên nû bên. Tê payîn ku zextên li ser Hêzên Sûriyeya Demokratîk zêde bibin û ev jî bibe sedema gurbûna şer. Ger dewleta Tirk ya dagirker li dijî Kurdan tevgereke leşkerî bike, ev yek wê bandoreke neyînî li sivîlên herêmê bike, ku ji niha ve rastî qeyranên mirovî û pevçûnên berdewam tên. Dibe ku ev meyl jî bibe sedema aloziyên siyasî û leşkerî li ser gelê Kurd, ji ber ku her danûstandinên paşerojê dê bêyî nûneratiya wan çêbibin û erenîbûna wan danustandinan paşeroja siyasî bi rejîmê re kêm bibe.

**Çavkaniyên pêşerojê**

Di navbera Enqere û Şamê de nêzîkbûn çêbibe jî, Kurd dê li herêmê hêzeke çalak û tevgerin. Hewildanên Enqere û Şamê dijî deskeftiyên gelê Rojavayê Kurdistanê ye. Dîroka têkoşînê ya Kurdan nîşan daye ku li hemberî gelek tifaq û hevkariyên ewlekarî, siyasî û leşkerî yên ku dixwestin wan biçûk bixin, xwedî sekneke xortin. Tevî hemû komployên xerab jî Kurd man û ew plan têk çûn. Lê, nêzîkbûna Erdogan û Esed rêyeke tevlihev nîşan dide ku ji tenê peywendîyên dualî derbas dibe, ji ber ku aliyên ewlekarî, siyasî û mirovahî li hev dikin. Ji bo ku qeyranên însanî û cudakarîyên ku berê li herêmê dîtîye dubare nebin, divê bala navneteweyî zêdetir li paşeroja Kurdan li Rojava be. Dibe ku ev nêzîkbûn bandoreke berçav li paşerojê ya Sûriyê bike û civaka navdewletî divê bi baldarî çavdêriya wê bike da ku piştrast bike, ku ti alî neyên paşguhkirin an jî, binpêkirinên mafên mirovan di çarçoveya zêdebûna nakokiyan da neyên berbiçav.



# 'Serdan û xebatên insiyatîfê pîroz in'

Welatparêzê ku insiyatîfê serdana wî kiribû, Şêro Şero da zanîn ku xebata Insiyatîfa Sûrî ya ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan xebateke pîroz e. Herwiha Şero diyar kir ku bi saya insiyatîfê û gelên azadîxwaz îro mijara azadiya Rêber Apo li ser asta cîhanê tê nîqaşkirin.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Insiyatîfa Sûrî ya ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan di pilangeriya xwe ya serdanên pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de berdewam e. Girêdayî heman mijarê Yek ji pêkhateyên Qamişlo Şêro Şero yê ku Insiyatîfa Sûrî ya ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan serdana mala wî kiribû, bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Hûn projeya serdanan a Insiyatîfa Sûrî ya ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocelan, di nav pêngava azadiya Rêber Apo ya cîhanî de çawa dinerxînin?**

Dema ku mirov mijara tecrîda ku li ser Rêber Apo tê meşandin, bîne ziman divê mijara nirxandin di çarçoveya Rojhilata Navîn û cîhanê tevî de bin. Sedem ew e ku bêhtirî ku Rêber Apo rêberekî kurd be, ew rêberekî navnetewî ye û rêberê hemû gelên azadîxwaz e. Lê ev zêdeyî sê salan ku tecrîd li ser tecrîdê di derheqê Rêber Apo de tê meşandin. Herwiha ew ji hemû mafê zagonî, exlaqî û civakî bêpar maye. Ji ber vê yekê jî gelên herêmê, Insiyatîfa Sûrî ya ji bo azadiya Rêber Apo dest bi pêngava cîhanî ya azadiya fîzîkiya Rêber Apo kirin. Di serî de insiyatîf li tevahiya Sûriyê hat avakirin û xebat di warê lidarxistina çalakiyan de dest pê bû. Yekem pilan ku hat destpêkirin; komkirina îmzeyên pêkhateyên Sûriyê ji bo azadiya Rêber Apo bû, ji xwe bi hezaran îmze hatin bi destxistin û ev îmze jî ji saziyên hiqûqî yên cîhanî hatin rêkirin. Bi riya pêngavê re û gelên azadîxwaz, meş, kongir, û hwd… me dikarîbû bandoreke mezin li ser asta cîhanê tevî çêbikin û mijara azadiya Rêbertî di civînên cîhanî de bixin cihê nîqaşê. Ji xwe di van rojên dawîn de me dît ku Yekîtiya Ewripî hişyariyek ji bo tecrîda li ser Rêber Apo tê meşandin û kiryarên ku di derheqê wî de tên kirin, ji dewleta Tirk re rê kir. Ev yek jî bi saya Insiyatîfa Sûrî bû, wê destpêkê ji bo azadiya Rêber Apo xebateke ewle û pîroz da meşandin. Di destpêkê de li taxan meş û kombûn li dar ketin, hevdîtin bi partiyên siyasî re hatin çêkirin, hetanî ku gihaşt vê roja îro.

**Bi çi rengî serdan tên kirin, mijarên ku tên gotûbêjikirin li ser çi ne û helwesta we ji bo pêşwazîkirina insiyatîfê çawa ye?**

Weke em dizanin Insiyatîfa Sûrî di heftiya bûrî de dest bi serdana pêkhateyan kir, şensê min hebû ku di mala min de yekem seredan hate kirin. Me bi dilekî xweş û serfiraziyekê pêşwaziya endamên insiyatîfê kir. Pê re jî ez di nav komîteya serdanan de bûm û li taxa Cûdî bi hev re me serdana şêneyan kir. Endamên Insiyatîfa Sûrî ya ji bo Azadiya Rêber Apo tev jî hevdîtin bi Rêbertî re kiribûn, ramanên wî baş nas kiribûn. Lema jî di hevdîtinên bi pêkhateyan de semînerên curbecur, raman û parêzerên Rêber Apo di serlêdanan de dihatin giftûgokirin û dayîn. Herwiha şîroveyên Rêber Apo yên têkildarî yekbûna gelan, asta şoreşgerî, şehadet û berxwedanê ji aliyê insiyatîfê ji bo malbatan hatin vegotin. Serdanên ku ji malbatan re tên çêkirin gelekî sûdmend in, moral û hêzê dide gel jî. Gelê ereb, suryan, turkmet û hwd… bawerî bi fikir û felsefeya Rêber Apo anîne. Di vê çarçoveyê de jî wê serlêdan ji Qamişlo û kantona Cizîrê hatin destpêkirin û hêjayî gotinê ye ku wê li hemû pêkhateyan li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bidome.

**Banga pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û gelên azadîxwaz ji bo azadkirina Rêber Apo ya fîzîkî çi ye?**

Îro li seranserî cîhanê fikrê netewperestî û kapîtalîzam nûjen derketiye pêş, van aliyan iştirakiyet xist nava zikê xwe û ew



pişaft. Li hemberî van pergalan jî felsefeya Rêber Apo ya Neteweya Demokratîk derketiye pêş. Xeta Rênber Apo ya siyem ew e xeta ku dikare bihêle aştî, aramî û demokrasiyê li Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê biafrîne. Ev yek jî bi azadiya Rêbertî tê pêkanînin. Gel dikeve wê baweriyê de ye ku azadiya Rêber Apo, em jî vê rastiyê dizanin ku azadiya Rêber Apo azadiya civakê, jinê, li Rojhilata Navîn e û azadiya tevahiya gelên bindest ên cîhanê ye. Di dema heyî de eger fikr û ramanên Rêber Apo di warê piratîkî de pêk were, wê azadiya gelên herêmê were bidestxistin. Jin û ciwan pêşngtiya fikr û felsefeya Rêbertî dikin, eger tevahiya gel bi vî rengî tevbigerin, wê Rêberê me azad bibe. Gelê kurd û tevahiya gelên dost erkdarên azadiya Rêber Apo ne, lewma pêwîste jin, ciwan û gel bi temamî asta têkoşîna ji bo azadiya fîzîkî ya Rêbertî bilind bikin. Wekî din jî em ê hertim li ser xeta Rêbertî û şehîdên azadiyê têbikoşin hetanî ku Rêberê xwe azad bikin.

## Rewşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê



**Zekî Bedran**

Li Bakur û Rojhilatê Suryeyê gelek hêz dixebitin ku Rêveberiya Xweser bi ser nekeve û tasfiye bibe. Qismekî ku bi rêxistin nabin û perwerde nabin jî, ji van faliyetên dijber bandor dibin. Her wiha êrişên domdar yên tunekirina îstîkrarê, şikenandina hêviya gel û terikandina axê, dike hedef. Di serî de xebatên dewleta Tirk ên îstîxbaratî û falîyetên çeteyên girêdayî wê, her wiha heman faliyetên hêzên hikûmeta Şamê jî bi daxwaziya ku li herêmê jiyan neyê jiyankirin, tên kirin. Li hemberî hemû rêbazên şerê taybet yên faliyetên dijber, avakirina civakek bi hişmendî wek pirsgirêkek jiyanî li pêşberî Rêveberiya Xweser disekine.

Zêdebûna domdar a dolar û daketina nirxê Lîreyên Sûryeyê xizaniya xelkê kûrtir dike. Her wiha welat di bin ambargoyê de ye. Ji ber ku hilberîna ku pêdiviya welêt pê heye nayê hilberandin, gelek tişt ji derve tên îthalkirin. Li hemû sînoran qaçaxçîtiya berfireh heye, dewlet û îstîxbarata wan tê de ne. Sazkirina sîstemeke gumrikê ya birêkûpêk û bikêrhatîkirina wê ne hêsan e. Piraniya kel û pelên ku ji derve tên bi dolar tên kirîn. Ev dibe sedem ku bihabûn mayînde bibe. Dema ku sîstema bacê neyê birêxistinkirin, çavkaniyên dahata herêmê her ku diçe teng dibe. Qanûn bi rengekî têne derxistin, her çendî ji bo pratîkkirina wan hewldan hebe jî, ne hêsan e ku vê yekê bike sîstemek û saz bike.

Rêveberiya Xweser alîgirê wê ye ku karên bazirganî bi giranî bide nava Sûryeyê. Naxwaze bazar bi kel û pelên Tirkan tije bibe. Li Başûrê Kurdistanê herî zêde kel û pelên Tirkiyeyê ne. Lê rêveberiya Şamê ji aliyekî ve bac ji kel û pelên ku dikevin herêmên xweser de digre û dibe sedema bilindbûna bihayan û ji aliyê din ve jî ambargoyê ferz dike. Armanca wan ew e ku herêmê bikşînin nava krîz û kaosê. Naxwazin Rêveberiya Xweser bijî û modêlek demokratîk derkeve holê. Ew vebijêrka demokratîk, ji bo bekaya xwe xeter dibînin.

Tevî gelek kêmasî, şert û mercên dijwar jî, Rêveberiya Xweser nêzî milyonek xwendekar perwerde dike. Perwerde bi zimanên Kurdî, Erebî, Suryanî û hwd. tên dayîn. Ji bo ku her pêkhateyek zimanê xwe bi kar bîne û bi pêş bixe, bi taybet nêz dibe. Zarok bi salan e dixebitin û dixwînin, lê hikûmeta Şamê bawernameyên wan ne derbasdar dihesibîne. Armanca wan ji vê yekê ew e ku zîhniyeta yekpartîbûnê serdest bikin û desthilatdariya xwe dirêj bikin. Nexasim cihê ku dibistanên hikûmeta Şamê lê hene, hijmareke ne kêm a zarokên ku ji aliyê malbata xwe ve tên şandin hene. Hikûmeta Şamê bi ceribandina hemû rê û rêbazan û bikaranîna amûrên jiyanê weke çekekê dijber, dixwaze herêmên xweser têk bibe û di encamê de ji holê rabike.

Dewleta Tirk mîna Efrînê herêmên ku di qirkirina etnîkî re derbaskiriye, bi qedexekirina ziman, nahêle ku zimanê Kurdî bibe zimanê perwerdeyê. Her çiqas gelek caran dibêjin em li dijî "terorê" ne jî, diyar e ku armanca wan tunekirina gelê Kurd e. Li Efrînê PKK û PYD nîne. Her çiqasî hejmareke biçûk be jî hin Kurd mane. Ger hedef ne Kurd bin, qedexekirina perwerdeya bi zimanê zikmakî çawa dikare were ravekirin?

Rêveberiya Xweser li herêmên ku ji çeteyên DAIS'ê hatibûn paqijkirin hat înşakirin. Yên ku xweserî ava kirin, berê ne xwediyê ezmûn û zanîna xurt bûn. Parastina nirxên ku hatibûn bi dest qezenckirin xistina bin xizmeta gel de esas bû. Çavkaniya girîng a dahata herêmê, petrol bû. Di şer de piraniya bîrên petrolê hatin texrîbkirin. Bi qasî ku em dizanin, tenê ji sedî bîst ji wan bîran hatine sererastkirin û xebitandin. Parzûnkirina petrola ku hatiye bidestxistin û pêşkêşkirina wê ji gel re jî rêxistinbûneke berfireh dixwaze. Nefta ku tê derxistin bi bihayên fermî ji bazaran re nayê pêşkêşkirin. Di vî warî de pirsgirêkên cidî yên aborî û hevsengiya butçeyê yên Rêveberiya Xweser hene.

Pirsgirêkeke din a girîng jî polîtîkaya hilberîn û genim e ku ji pergala Baasê hatiye dewrgirtin e. Nîvê budçeya wan diçe kirîna genim. Li şûna ku hin destek ji hilberîneran re were dayîn an jî beşek diyarkirî ya kel û pelên çandiniyê bigire dest, polîtîkayek bêveger tê meşandin. Genim bi bihayekî hema ji bihayên cîhanê bilindtir tê kirîn. Ji firinan re hema hema ard belaş tê dayîn. Bihayên tov, genim û ceh jî di heman rewşê de ne. Nan hema hema bi tevahî di firneyên ku ji aliyê Rêveberiya Xweser ve têne çêkirin de tê çêkirin. Biha ewqas erzan in ku hin kes nan hişk dikin û wek xwarina heywanan bi buhayekî zêde difiroşin. Ev nahêle ku çerxa aborî bizivirîne û budçeyê bi hevseng bike. Rast e hêza kirîna gel ne zêde ye. Lê bi qasî ku em dizanin, di cîhanê de cihên ku herî zêde petrol û nan lê erzan in, herêmên Xweser in.

Kesên ku van tişta baş dizanin hene ku divê ji gel re vebêjin. Lê me xwest gel jî û kesên ji derve temaşe dikin jî bizanibin ku li herêmên xweser, bi dagirkerî û êrîşan re paralel pirsgirêkên perwerde, tenduristî, aborî û rêveberiyê hene. Eşkere ye ku lazime Rêveberiyên Xweser wextê xwe hîn baştir bikar bînin û bi awayekî hîn bi bandortir û bileztir bikevin tevgerê.

## 3 şehadetên çapemeniya azad



**Farûk Sakik**

Piştî ku di sala 1984'an de li Kurdistanê şerê çekdarî dest pê kir, her tişt guherî. Herkesî xwe li gor vî şerî ji nû de bi rêxistin kir û pozîsyon girt. Rojnamevanên Kurd jî di vî şerî de li gorî pêvajoyê birêxistin bûn. Kovar û rojname derdiketin. Rojnamegerî beşek têkoşîna azadiya Kurdistanê bû. Di nav van xebatan de me Apê Mûsa nas kir. Mûsa Anter. Wî beriya PKK'ê, beriya hemû tevgeran, di sala 1942'an de dest bi rojnamegeriyê kiribû. Ne bi tenê rojnamegerî, di heman demê de ji bo ciwanên kurdan jî dixebitî. Ji bo ciwanên Kurd ên hatibûn Stenbolê bi navê Dîcle şevîniyek ava kiribû. Di pêvajoya van xebatan de Abdurehman Qasimlo jî nas kir. Ji bo xwendinê hatibû Stenbolê. Dema Apê Mûsa ew nas kir û cewhera wî dît. Nexwest li Stenbolê bimîne û ew şand Parîsê, cem Kamuran Bedirxan. Qasimlo li vê derê dest bi xebatên doza Kurdistanê kir. Di sala 1972'yan de Rêber Apo jî nas kir. Di civîna DDKO ya Stenbolê de, dema ku axivî herkesî wî meraq dikir. Apê Mûsa bi israr nedixwest ev kes deşîfre bibe. Wî cewhera Rêber Apo berî vê civînê dîtibû û ew diparast. Di sala 1984'an de bi destpêka şerê çekdarî, ew jî hatibû di eniya çapemeniya azad de cih girtibû. Ew Çinara Kurdan bû. Tecrûbeyên xwe yên salan bi nifşê nû re parve dikir. Stenbol bû. Ji doza 49'an hetanî wê rojê hin xeyalên wî hebûn. Bi PKK'ê û bi pêngava 15'ê Tebaxê êdî gihîştibû wan xeyalên xwe. Van xeyalên xwe wek çavê xwe diparast. Dijmin ev yek dîtin û di 20'ê Îlona 1992'yan de ew şehîd kirin. Dema Apê Mûsa şehîd bû, bi navê Seyît Evran kesek dest bi rojnamegeriyê kiribû. Seyîd Evran jî rojnamevanek şoreşger bû. Dema li eniya legal dît çembera dora wî teng dibe, dixwest ber bi çiyayên azad ve rêwîtiyekî bide destpêkirin. Di sala 1995'an de li Amedê li bajarê xwe bû. Derbasî çiyayên azad ên Kurdistanê bû. Bi salan li nava gerîlayên azadiyê geriya, li ser jiyan û têkoşîna wan lêkolîn kir û ev yek ji gelê Kurd û cîhanê re ragihand. Ji wê derê derbasî Rojava bû. Dem bi dem li Başûrê Kurdistan jî me ew didît. Piştî Seyît Evran em hîn bûn ku, şoreşger, bi yek xebatek, bi herêmek, li deverek statîk kar nakin. Li kuderê pêdivî hebe li wê derêne. Seyît Evran jî wisa bû. Bi cesaret di qada şer bû. Rastiya şer û berxwedana gerîla bi cîhanê re parve dikir. Ew bi van xebatên xwe bersiv dida kesên ku dibêjin, 'rojnamevan ji şer, tevger û partiyan dûr bisekinin' dida. Gulistan Tara û Hêro Bahadîn jî wek wî bûn. Li Silêmaniyê rojnamegerî dikirin. Şerê serdema nû dişopandin. Bi cesaret bûn. Li herêma ku dewleta Tirk a dagirker bi hemû îstixbarata xwe ve bi cih bûbû de, rojnamegerî dikirin. Ev cesaret ne karê herkesî bû. Seyît Evran di sala 1995'an de wek wan herduyan dîtibû şer mezin dibe û dive ku civak rastiya vî şerî bibîne, çûbû herêmê. Ew sal jî salên zor û zehmet bûn. Gulistan Tara û Hêro Bahadîn jî, şerê ku ji sala 2021'an de destpêkiribû û dijmin heroj di medya xwe de behsa qehremaniya xwe dikir, ev derew teşhîr dikirin. Berevajiyê vê yekê lehengiya gerîla parve dikirin. Ji bo vê yekê bûn şehîdên çapemeniya azad yên dawî.